bikin, pêwîstê em istiratîciya xwe li ser şiyanên xwe yê taybet ava bikin, û du re piştgiriya Emerîka yan a Yekîtiya Ewrupa bixin nav factorên şiyan û hêzên xwe.

Lê mixabin îro em dibînin ku hindek siyastvan, hindek rêkxistin bi bîrûbawerên ku Emerîka û Peymana Nato amade ne ji bo destên xwe bidin pişta miletê Kurd li Sûriya , ev baweriya han di gel baweriyek kûr ; ku rêjîma Sûriya li ber herfandinê ye û ev herdu bawerî bûne bingeh ji bo çalakiyên û siyaseta wan ê giştî û ez bawerim ku çewtiya vî ramanî ron û aşkira ye .

4- Hûn rewşa tevgera kurdî li Sûriyê çawa dinirxînin?. Çi kar û xebat li bal partiya we ve ji bo yekirina gotina wî dibe?

Ji dema ku ev guhertinên li cîhanê peyda bune, bi rastî, guhertinek xurt di rewşa tevgera kurdî de jî peyda bûye, nemaze ji roja 12 Avdarê bi mebesta yekkirna helwêst û gotar û çalakiyên tevgerê , û em dişên bêjin kû ew bûyera hovane çavên berpirsiyara vekir ser rasteqinekî giring kû ne tenê siyaseta kurdan li Sûriyê qedexe ye. Lê belê hebûna kurdan li Sûriyê ne bi xweşê disthilatê Ye , di encam de rêkxistinan bi tevayî xwe dan dor hev û çalakiyên hevbeş hatine rûdan û em dişên bêjin kû ev peymana di nav- bera Ber û Hevbendî yê de , û hevbendiya digel bizavên dîmokratiyên Ereb di Daxwyaniya Dimeşq ê de ew jî ji sedema wê bûyer a navdar bû. Di vê çarçewa han de, em dikarin bêjin ku ((Partî pişikdariyek baş kir)) .

5- Enî û Hevbendiya kurdî di danezana Şamê de cih girtine, hin gazin têne kirin ku, di belgenameya wê ya bingehîn de, mafên gelê kurd bi xurtî cih ne girtine. Di vî warî de, hûn çi dibêjin?.

Dema me çend mafên rewa ji Kurda re di belgenamê de çespandin , me di wî sînorî de danî ji bo hêzên Erebî pesend bikin û bibin di nav erkên van hêzan, ev di gumana min u hevalên Hevbendî û Berê de tê nirxandin wek serketinek bilind û xurt, lewra ev mafên han , ew bi tenê ne ku di programên rêkxistinên me de hatine nîşan kirin. Bê guman e mafên kurdan, di serxwebûnê de mafekî rewa ye, lê, ku doza wî mafî bike pêwîste ku çek û rextên xwe amade bike û dû re dozê bike, û ne rajê rim a ku ji dar çêbûyî rengê Don-Kîşot.

6- Îro, Enî û hevbendiya kurd karên hevbeş bi hev re dikin, ev yeka han cihê dilxweşî û pîroziya gelê me ye. Gelo hun di Enî û Hevbendiyê de hewil didin ku encumeneke kurdî li Sûriyê bê avakirin, hemî hêz û rêxistinên kurdî û kesayetiyên xweser cihên xwe têde bigrin?.

Birastî, damezrandina encumenek bo sercem kurdên Sûriya daxwaziyek giring û hêja ye xebatê, lê ji bo kû ev encumen xwedan sûd û mifa be, pêwîst e ku endamên wî yên xweser hilbijartî bin ji nav kesayetiyên ne alîgirê tu partiya bin. Û divê ku nûnerîtiya sercem, komele, sindika, eşîr û nûnerên sercem çalakiyên civakî, kultûrî û hunerî têde amadekirî bin, û mercê diwemîn ji bo serketina vê projê aşkirahî ye, û biryarên wî bên rêz girtin wek yasayên rewa ku ji bal desthilatekî ve tên der . **D.R.(19)**